Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: 65
15'ê Hezîran
Buha: 150 Tûmen

agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

## Pîroz Be 27'emîn Salvegera Avabûna RDK Îranê

Em li bereberê 27'emîn salvegera avabûna **Radyo Dengê Kurdistana Îranê** de ne. Dengê Kurdistana Îranê, dengê heqbêjî, azadîxwazî û mezlûmiyeta gelê Kurd, dengê berxwedanî û qehremanetiyên hêza Pêşmerge ye. Dengê rastîn yê gelê Kurd û pira qahîm di navbera PDK Îranê û xelkê Kurdistanê di Îranê de ye.

Em wekî **Desteya Weşana Agirî**, 27'ê Cozerdanê ji tev xebatkarên vê radyoyê, xelkê Kurdistanê û hemû evîndar û guhdarvanên vê radyoyê pîroz dikin û hêviya me temen û xebatek dûr û dirêj bo radyo û xebatkarên wê ye.

# ERDOXAN Lİ DİJÎ OPERASİYONÊ DERKET



Di civîneke taybet ya Serkirdatiya siyasî ya Turkiyê de li bîroya Serokkomariyê, nîqaş li ser wan pirs û astengiyan hate kirinê ku tûşî Turkiyê hatine, bi taybet pirsa êrîşa leşkerî ya li dijî Herêma Kurdistanê.

Di civînê de ku Serok Wezîr, Wezîrê Karê Derve, Yaşar Biyûk Anit û fermanderên arteşê beşdar bûn, biryar hat dayîn ku nabe êrîş bo ser Herêma Kurdistanê bê kirin.

Herweha tekez li ser şerê li dijî PKK'ê heta jinavbirina wê hat kirin. Erdoxan da zanîn ku nabe ew xebat û şerê me demokrasî, mafê mirov û yasayê jar û zeîf bike.

Erdoxan êrîşa bo derveyî sînor bi karek nebaş ya siyasî û leşkerî da zanîn û got: *"Li Bakûrê Îraqê de 500 çekdarên PKK'ê hene, lê di çiyayên Turkiyê de, 5000 çekdarên PKK'ê hene. Ma şerê me li dijî 5000'an bi dawî bûye heta ku em biçine pey 500 kesan."*

Axaftina Erdoxan kete ber şopa rexneyên tund yên şovenîstên Turk. Ji wan Deniz Baykal ku got: '"Gotinên Erdoxan wiha nîşan dide ku wî hêj hest bi wê nekiriye ku PKK ji aliyê Herêma Kurdistanê ve tê piştevanîkirin". Wî daxwaz kir ku rê ji ber êrîşa leşkerî bo derveyî sînor nehê girtin.

Di vê derheqê de Amerîka, Nato û piraniya welatên Ewropayê hişyarî dan Turkiyê û li dijî êrîşa leşkerî derketin û xwazyarê hevahengî û hevkariyên siyasî yên li navbera Enqere- Bexdad- Waşîntonê di berengarbûna bi pirsa PKK'ê re bû.

## Îran Ji Bo Talîbanan Çek Û Sîlahan Dişîne



Karbidestekî Amerîkî, dewleta Îranê bi şandina çek û sîlahan bo Talîbanan li Efxanistanê sûçdar kir. Nîkolas Bêrnz, Cîgirê Wezareta Karê Derve yê Amerîka, roja sêşem, 12'ê Hezîranê, li Parîsê ji nûçegihanan re got ku Îran ji hêzên terorîst û rakîkal ên Rojhilata Navîn re alîkariyê dike û ewlehiya herêmê têk daye.

Bêrnz her wiha got, Îran niha heta ji bo Talîbanan li Efxanistanê jî çek û sîlahan dişîne.

Wezîrê Parastinê yê DYA'ê, Rabert Gîtz jî gotibû ku hin belge hene ku nîşan didin ku hinek çek û sîlahên çêkirî ên Îranê di destê Talîbanan de hatine girtin.

Rayedarên Efxanistanê ev îdeaya berpirsiyarên Amerîkî red kirine!



**Hunermed Nîlufer Akbal bi Agirî re dipeyve**

R: 10-11

**Hevpeyvîn Bi Dr. Mûsa Kaval Re**



R: 3-4


**Gotûbêj Bi Şeytên Re**



2

**Komîteya Navendî Ya PDK Îranê Civîna Dehemîn ...**

4

**Hiqûqên Bingehîn, Rexne Û Şiroveya Qanûna Bingehîn Ya Îranê**



6

**Zarokên Îranê Bêpar Ji Cîhaneke Hêjayî Jiyana Xwe**



7

**RONESANS**



9

# Gotûbêj Bi Şeytên Re*

**Selah Muradî**
**Wergerandin: Rondik**

Gotûbêj bi Amerîkayê re ew tilisma ye ku di Komara Îslamî ya Îranê de tenê rêber dikare bişkîne. Her çiqas pasawa Xomeynî bo wî karî bibîrxistina erkên Amerîkayê li Îraqê û alîkariya xelkê wî welatî bû, lê di rastî de eva zext û givaşên dewleta Bûş ji bo gotûbêjên li ser Îraqê bû ku rejîm neçar bi girtina vê helwestê kir. Merema dewleta Bûş ji gotûbêjê eva bû ku bi xelkê Amerîka û dewleta Îraqê – ku daxwazkarê gotûbêjên di navbera Îran û Amerîkayê de bûn – nîşan bide, ku bo dawîanîn bi desttêwerdanên Komara Îslamî li hundirê Îraqê de ji rêya gotûbêjê jî dê mifahê bistîne. Lewra ger Komara Îslamî ne amadeyî gotûbêjê biba, dê di warê dîplomasiyê ve terîk (munzewî) û helwestên wê jar û lawaztir dibûn, ku eva jî ji aliyê din ve dibûye sedema bihêzbûna helwesta Amerîkayê.

Cuda ji vana jî gotûbêj bi Amerîkayê re ji aliyê dewletekê ve birêve çû ku bi dewletek tundrew û pawanxwaz hatiye naskirinê û dijberiya bi Amerîkayê re yek ji siyasetên sereke yên wê ye. Ya ku cihê baldanê ye eva bû ku nûnerên Meclisa Pawanxwaz bi lezî proseya girûpa dostîniya navbera parlemana rejîmê û kongireya Amerîkayê anîne holê. Ew jî di halekê de ye ku bi xwe di dewrana Serokkomariya Xatemî de ji dijberên herî tund yên Amerîkayê bûn. Ewa jî vedigere bo wê çendê ku dewlet û parlemana pawanxwaz dixwazin ji gotûbêjên bi Amerîkayê re ji bo bihêzkirina cih û pêgeha xwe di hevrikiyên hundirê rejîmê de mifahê bistînin.

Kêmkirina êş û azarên xelkê Îraqê, piştevanî ji dewleta Îraqê û cihgirkirina ewlehî û aştiya li wî welatî de, ew merem in ku rejîm di rûyekî de weke armacên xwe bo gotûbêja bi Amerîkayê re da zanîn. Armanca Amerîkayê jî ji gotûbêjê eva bû ku rejîma melayan neçar bi ne maytêkirin di kar û barên Îraqê de û herweha piştevanî nekirin ji terorîstan bike. Eva jî li halekê de bû ku herdu aliyan li ser neguherandina siyasetên çendîn salî yên xwe li hemberî hev de tekez dikirin û bîîsrar bûn û bi kiryar jî cehd û xebat bo pêkanîna eniya dijî hev di asta deverê de domandin. Ew helwest û xebat jî bûne sebeba kêmrengbûna girîngiya gotûbêjên her du aliyan li ser Îraqê. Çimku heya pirsên sereke yên di navbera du welatan de neçareserkirî bimînin, pir zemmet e bikarin li ser çareserkirina pirsên derveyî yên xwe li hev bikin.

Bi wateyeke din pirsgirêkên navbera rejîm û Amerîkayê li Îraqê de berhem û encama pirsên bingehîn yên li navbera her du welatan e û heta her du alî Îraqê weke qada berxwedanî û rikeberaniya hev bibînin, nikarin ji rêya gotûbêjê ve bi encamên dilxwaz yên xwe bigihîjin. Herweha rejîma Komara Îslamî li ser vê baweriyê ye ku her terze alîkariyek Bûş bo çareserkirina pirsa Îraqê dê bibe sedema serkevtina Amerîka li Îraqê û pêşveçûna prosesa demokratîzasiyonê di Rojhilata Navîn de. Lewra tenê di demekê de dê hevkariyek wiha bike ku giranî û nifûza wê li Îraqê de bihê parastin, eva jî tiştek e ku tevî siyasetên dewleta Bûş bo terîk(munzewî)kirina Komara Îslamî û piştgirtin ji desthilatdarên vê rejîmê di welatên deverê de dijberî heye.

Dewleta Bûş dixwaze ji rêya gotûbêjê qasekê dikare alîkariyê bide çareserkirina pirsên wî welatî?

Hin siyasetvan û berpirsiyarên Îraqê li ser vê baweriyê ne ku ev welate cuda ji kirîza ewlehiyê, bi pirsa siyasî re jî berbirû ye û pêkhatina lihevhatin û yekîtiyek herêmî û navneteweyî ji bo çareserkirina van pirsgirêkane tenê di demekê alîkar dibe ku aştî û yekîtiyeke neteweyî di navbera hêz û aliyên siyasî yên hundirê Îraqê de pêk bihê. Lewra heya li hundirê Îraqê de rê çareseriya tevalî û cihê pesenda hemû aliyan ji bo pêkanîna aştî û yekîtiya neteweyî negirin pêşiya xwe, hêviyek geş ji bo lihevhatinên herêmî û navneteweyî nabe.

Her çende balyozê Amerîka di axaftina piştî gotûbêjê de, pêvajoya gotûbêjan bi erênî nirxand, lê her du alî jî bi tu lihevhatinek diyarîkirî negihîştin û bi liberçavgirtina rewşa navxweyî ya Îraqê û ve dawî bi destêwerdanên rejîmê di Îraqê de bîne û Komara Îslamî jî ji vê rêyê ve dixwaze nifûz û pirestîja xwe bi bihêzkirina dewleta Malikî li wî welatî de bibe jor. Siyasetek ku cuda ji dijberiya Amerîkayê, tevî dijberiya Erebên Sunnî yên Îraqê û welatên Erebî yên deverê jî berbirû bûye.



**Gotûbêjên nûnerên Amerîka û Komara Îslamî ya Îranê piştî 28 salan li Îraqê**

Bi wê sedemê jî anîne rojeva pêşniyaza pêkanîna komîteyek sê alî, pêkhatî ji Amerîka, Îran û Îraqê bo çareserkirina kirîza Îraqê ji aliyê balyozê Îranê ve tevî dijberiya Erebên Sunnî yên hundirê Îraqê û welatên Erebî berbirû dibe. Çunku wan aliyane bawerî bi dewleta Malikî nînin û li egera pêkanîna komîteyek han de dixwazin nûnerê wan jî têde pişikdar be.

Li vir pirsek tê holê ku lihevkirina Îran û Amerîkayê û desthilgirtina rejîmê ji detêwerdanên hundirê Îraqê heya çi pirsên eslî yên navbera Îran û Amerîkayê, çavnihêriya encamek baş û erênî ji wan gotûbêjan di pêşerojê de nahê kirinê. Nemaze domandina bi gotûbêjan jî – ku pişniyaza balyozê rejîma Îranê li Îraqê de bû – di demek han de heta ku diçe, dewleta Bûş givaşên xwe ji bo munzewîkirina Komara Îslamî rijd û xurttir dike û rengê hindê nade bi encamek baş bigihîje.

* Rêberên Komara Îslamî heya niha jî Amerîkayê bi şeytanê mezin dizanin û di vê dawiyê de jî Elî Larîcanî, Amerîka bi şeytanê xwerazî hesiband ku bi çavekî sivik ji Komara Îslamî re dinêre. Gava ku yek ji aliyên gotûbêjê wêne û rûçikek wiha ji aliyê dinê hebe, encama gotûbêjê dibe çi be?

www.a...kurdî.org

# Rojeva Mezintirîn Konferansa Li Ser Çareserkirina Pirsa Kurdî Li Bakûrê Kurdistanê Ji Aliyê Parlemana Ewropayê, Di Hevpeyvînekê De Bi Dr. Musa Kaval Re

***Di pêşerojeke nêzîk de, Parlemana Ewropayê li Birûkselê mêvandarê mezintirîn konferansa li ser çareserkirina pirsa Kurdî li Bakûrê Kurdistanê ye.***

***Zêdetirî salekê ye ku Hevbendiya Demokratîk ya Kurdên Bakûr ji bo lidarxistina vê konferansê dixebite. Bo bas û guftûgokirin li ser aliyên cuda cuda ên vê konferansa mezin, me bi Musa Kaval, Nûnerê Hevbendiya Demokratîk ya Kurdên Bakûr re hevpeyvînek çê kir. Eva pirsên me û bersivên Dr. Musa Keval di vê derbarê de:***

**Hevpeyvîn/ Azad Kurdî**

Dr. Musa Kaval: "Em ji YE'ê dixwazin ku Kurdan wek gelê duyemîn li Tirkiyê nas bike, terefê kurd bike muxateb"



***Dr. Musa, çawa bû ku biryara pêkhatina vê konfernasê hate dan?***

Biryara çêkirina vê konferansê pir bi zehmet bû. Ev demek dirêj e ku em bi rêveberên YE'ê re têkilî û danûstandinan di mustewayên cuda de dikin û dîtinên terefê kurd li ser çareseriya pirsa gelê kurd li Bakurê Kurdistanê pêşkêşî wan dikin. Yek ji xalên bingehîn yên van hevdîtinan ew bû ku Ewropa girîngiya siyasî ya çareserkirinek adil û demokratîk ji bo pirsa gelê kurd li Tirkiyê gora rastiya wê, bibîne û ji bo vê çareseriyê bibe teref.

Ev çend sal in ku em tezek xwedan girîngiyek siyasî û jeopolîtîkî di vê derbarê de pêşkêşî YE'ê dikin. Bi taybetî em diyar dikin ku hem di berjewendiyên YE'ê de ye, hem di berjewendiyên gelê tirk de ye û hem jî di berjewendiyên gelê Kurdistanê de ye ku pirsa kurd li Tirkiyê bi riya aştî û demokrasiyê bête çareserkirin.

Me digel serokatiya grûbên partiyên Parlementa Ewropa ji hemû bask û îdeolojiyên siyasî têkilî danandine. Em ji YE'ê dixwazin ku ew helwestek bi cisaret û xurt ji bo vê çareseriyê bigire û Kurdan wek gelê duyemîn li Tirkiyê nas bike, terefê kurd bike muxateb. Helwestek siyasî ya bi vî awayî dê bibe sedem ku Komara tirk îdeolojiya xwe ya nejadperestî biguherîne. Ev yeke dê herwesan bibe sedemê zefera baskê demokratxwaz li Tirkiyê û dê bibe destpêka çareseriyek demokratîk û adil ji bo pirsa gelê Kurd.

Pirsa kurd di cewherê xwe de pirsa neteweyek bê dewlet e, pirsek siyasî ye û pirsên din yên civakî, aborî û mafên mirovan pêve girêdayî ne. Ji ber ehmiyeta jeopolîtîkî ya Kurdistanê, ji ber girînigiya demografî, çandî û dîrokî ya Kurdan di Rojhilata Navîn de û ji ber pêvajoya endambûna Tirkiyê bo YE'ê, ev pirs di heman dem de pirsek navnetewî ye û pirsa Ewropa ye jî. Di berjewendiyên her kesê de ye ku ev pirse di demek nêzîk de bête çareserkirin.

***Konfernas kengê birêve diçe û kîjan hêz û alî têde beşdar dibin?***

Biryar hatiye dayîn ku ev konferans piştî hilbijartinên li Turkiyê di nêzîktirîn dem de pêk were. Em dikarin bêjin ku di payîza ev sal de konferans dê bê lidarxistin.

**Armnacên lidarxistina vê Konferansê çi ne?**

Ev Konferans di warê siyasî û dîplomasî de pir girîng e. Lewma ew ji aliyê grûpên partiyên siyasî yên YE, li Parlementa Ewropa bi awayekî resmî pêk tê. Ango grûbên partiyan ku her 25 dewletên Yekîtiya Ewropa temsîl dikin.

Yek ji xususiyetên vê konferansê, ev e: ew ne bes ji bo nîqaşkirina rewşa kurdan tê kirin. Rewş diyar e û pir caran hatiye nîqaşkirin. **Ev konferans bi taybetî dê li ser zelalkirina daxwazên Kurdan û herwesa ji bo cîbecîhkirina çareseriya pirsa Kurd li Tirkiyê bête kirin**. Ji bo vê armancê, pêwîst e ku kurd projeyek hevbeş ji bo çareseriya pirsa xwe pêşkêşî YE'ê bikin û Ewropa jî bi zelalî konsensus û daxwazên gelê kurd li Tirkiyê bizane. Ev konferans ne mîna konferansên berê ye. Konferansên berê di warê navneteweyî de çi sîfetê xwe yê temsîlî û resmî nebûn. Ji ber vê yekê, çi bandor yan encamên siyasî jê çê nedibûn.

***Piraniya Kurdên Turkiyê piştgiriya endambûna Turkiyê bo Yekîtiya Ewropayê dikin, hêzên siyasî ên Kurdên Bakur çi projeyek bona vê yekê hene û bo çareserkirina pirsa gelê Kurd dixwazin çi bikin?***

Ji bo ku mafên gelê Kurd li Bakurê Kurdistanê ji aliyê YE'ê ve û di qata navneteweyî de jî bên naskirin û pejirandin, pêwîst e ku Kurdan projeyek netewî hebe. Konsensusek netewî li ser wê bête kirin. Me projeyek hevbeş ji bo çareserkirina pirsa

www.arsiva.kurd.org

gelê Kurd li Turkiyê amade kiriye. Ev pirtir ji salekê ye ku me bi partiyên Kurdên Bakur, bi kesayetiyên Kurd re têkilî danandine û di encamê de pêşniyara projeyek hevbeş amade kiriye. Piraniya van partiyan muwafeqet li ser kirine. Hêvî heye ku ew proje bi dîtin û pejirandina partiyên din jî zengîntir û kûrttir bibe û di dawiyê de hemû hêzên siyasî yên kurd bi yekdengî pêşkêşî konferansê bikin.

***Di nûçeyan de hate ragehandin ku Hevbendiya Demokratîk a Kurdên Bakûr ji bo lidarxistina vê konferansê xebat kiriye. Wekî Nûnerê Hevbendiyê li ser xebat û çalakiyên wê rêxistinê bo me bipeyive?***

Hevbendiya Demokratîka Kurdên Bakur dixebite da ku gelê kurd li Bakurê Kurdistanê bi resmî wek gelê duyemîn li Turkiyê bête naskirin û gotûbêjên endambûna Tirkiyê li ser vê rastiyê bêne kirin. Mafên gelê kurd di konferansa navnetewî ya Sêverê de hatin qebûlkirin. Lê piştre di Konferansa Lozanê de hatin jibîrkirin. Di peyra siyaseta înkar û qirkirinê li dijî gelê kurd, dest pê kir û domand. Lê pirsgirêk herdem mezintir dibe. Rastî ew e ku ne çareserkirina vê pirsgirêkê, di hemû waran de, zererê dide her kesê, dide gelê kurd, dide Komara Tirk û di dema were de, dê ji bo Ewropa jî bibe sergêjiyek mezin. Ji ber vê yekê pêdivî ye ku bête dubarekirin ku çareseriyek demokratîk û adil di berjewendiyên her terefekê de ye.

Bê guman pêwîst e ku ev çareseriye mafên siyasî, îdarî, civakî, çandî û aborî yên gelê Kurd li Tirkiyê misoger bike.

***Daxwaziyên we yên sereke û berbiçav ji Ewropiyan re çi ne?***

Daxwazên me di projeyeke hevbeş ku min li jor behsa wê kir, hatine diyarkirin. Ew ji sê başan pêk tên. Daxwazên siyasî, yên aborî, yên çandî.



**Dr. Musa Kaval:**

***"konferans bi taybetî dê li ser zelalkirina daxwazên Kurdan û herwesa ji bo cîbecîhkirina çareseriya pirsa Kurd li Tirkiyê bête kirin"***

Bi kinî, em dibêjin gelê Kurd, gelê duyemîn li Tirkiyê ye, pêwîst e ku hem Tirkiye hem jî Yekîtiya Ewropayê vê rastiyê nas bike. Pêwîst e ku statuyek federal ji bo gelê kurd bête naskirin, mafên Kurdan yên siyasî, çandî, civakî û aborî bêne naskirin. Di hemû waran, hemû curên ferq û cudahiyê li ser gelê kurd rabe, zimanê kurdî bibe zimanê resmî di îdar û perwerdê de, di hemû qunaxan de.

***Hûn çend bi serkeftin û encamên erênî ên vê Konfernasê hêvîdar in?***

Serkeftin û encamên erênî ji bo vê konferansê mumkin in, eger Kurd bikarin xwe bikin muxatebek micid di qata ewropî û navnetewî de. Eger Hemû partiyên Kurd nemaze yên sereke, piştgiriya projeyek hevbeş bikin, di qata navnetewî de, di qata Kurdistanî de û li hember siyaseta dewla tirk yek siyaset û stratijiyê biparêzin, wê gavê destxistina encamên vê konferansê pir mimkun in. Ji xwe ev konferans dikare bibe sedemê afirandina siyasetek hevbeş ya hêzên siyasî yên gelê kurd li Bakurê Kurdistanê. Lê eger ev yek nehê kirin, wê gavê berpirsê mezin, guneha mezin li se van hêzan tê hesibandin, ew li hember gelê kurd berpirsiyar in. Ez bawer dikim ku hemû nûnerên siyasî yên kurd di vê derbarê de hesas in û dê bi awayekî laîq û erênî berpirsiyariya xwe ya tarîxî û netewî bi cih bînin.

Ji bo ku ew konferansa me bi ser bikeve û bikaribe dogma siyasî ya di encama Konferansa Lozanê de peyda bûye û siyaseta dewleta tirk li ser hatiye avakirin, ji holê rake, û di cihê wê de çareseriyek demokratîk ji bo pirsa gelê kurd bête dîtin, pêwîst e ku tevgera Kurd bi projeyek siyasî ya hevbeş û realîst gora rewşa îro, pêşkêşî vê Konferansê bike.

***Wekî xuya ye, hûn wek Hevbendî Federaliyê bo çareserkirina pirsa Kurd li Turkiyê dipejirînin, sedemên vê yekê çi ne?***

Rastiya siyasî, çandî, dîrokî û coxrafiya Kurdistanê û a gelê Kurd dide xuyakirin ku neteweya me yek ji çar neteweyên mezin di Rojhilata Navîn de ye.

Bi sedan sal in ku gelê kurd berxwdana siyasî bi curên cuda cuda dike.

Çareserериyek siyasî ya saxlem û berdewam ne mumkin ku kêm kêm statueyek federal ji bo gelê kurd nehê naskirin.

Digel vê yekê jî mafê gelê kurd wekî gelên din yê herêmê heye ku dewleta xwe ya serbixwe damezirîne.

**Spas.**

Spas xweş û hêviya serkevtinê bo we dixwazim

# Komîteya Navendî Ya PDK Îranê Civîna Dehemîn Ya Xwe Lidarxist

## *Daxuyaniya Defetra Siyasî Ya PDK Îranê Di vê Derheqê De:*

***Hevwelatiyên hêja!***
***Endam û alîgirên PDK Îranê!***

Komîteya Navendî ya PDK Îranê, hilbijartiya Kongreya Sêzdehem, rojên sêşem û çarşem, 12 û 13'ê Hezîrana 2007'an civîna xwe ya dehemîn lidar xist.

Civîn piştî îlankirina deqîqeyekê bêdengî bo rêzgirtin ji bîranîna şehîdên Kurdistanê dest pê kir. Piştre rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ji aliyê Deftera Siyasî ve rapora kar û çalakiyên Deftera Siyasî tevî rêxistinên siyasî ên Kurdistanî, nemaze rêxistinên siyasî yên Kurdistana Îranê pêşkêş kir. Piştî bas û dahûrandina wê raporê ji aliyê beşdarên civînê ve, Komîteya Navendî rapora han pejirand û ew beş ji xebat û tekoşîna Deftera Siyasî ya di navbera du civînên Komîteya Navendî de bilind û hêja nirxand û di vê derbarê de bernameya karê pêşerojê destnîşan kir.

Birêz Sekreterê Giştî yê partiyê di beşa duyem a karê civînê de, baseke tevalî li ser rewşa jêhatî ya kar û tekoşîna partiyê di warên cur bi cur de pêşkêş kir. Di wê beşa basa civînê de li ser kosp û astengên ser rêya tekoşînê û yek ji wan bandora nerênî ya hinek liv û lebatên ne şoreşgerane ku berê di partiyê de hatibûn cihgirkirin, bal hatibû kişandin. Herwiha bi armanca berbipêşveçûna bilez û bêtir ya partiyê û ji holê rakirina rêyên çareseriya mumkin bal hatibû kişandin û tekez hatibû kirin.

Ew beş ji karê civîna Komîteya Navendî bû sedema rizamendî û kêfxweşiya pilînomê û beşdariya çeleng ya hevalên rêberiya partiyê bo axavtin li ser wê basê û herwiha diyarîkirina mekanîzmekê ji bo wê armancê û erk û wezîfeya endamên rêberiya partiyê di vê derheqê de.

Civîna Komîteya Navendî ya PDK Îranê êvariya roja çarşem 13.06.2007'an, piştî du rojan bi serkevtinê ve dawî bi kar û xebatên xwe anî û beşdarên civînê vegeriyane cihê kar û tekoşîna xwe.

***Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê***
***Deftera Siyasî***
***14.06.2007***
***24.03.1386***

www.arsivakurdi.org

# Di Rê Û Resmekê De Bidawîhatina Zandora Destpêkîn Ya Siyasî Ya Kadroyan Hate Pîrozkirin



Bi boneya bidawîhatina bi serkevtî ya zandora destpêkî a perwerdeya siyasî ya Kadroyan ji aliyê Komîsyona Lêkolîn û perwerdeya PDK Îranê ve, roja duşem, 21.03.1386(11.06.2007)'an, bi beşdariya Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, birêz Mistefa Hicrî, hejmarek ji endamên rêberiyê, mamosta û beşdarên zandorê û hejmreke berçav ji Kadro û Pêşmergeyên PDK Îranê, rê û resmek di yek ji binkeyên Deftera Siyasî ya PDK Îranê de birêve çû.

Rê û resm demjimêr 10'ê serê sibêdê bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û ragirtina deqîqeyekê bêdengiyê ji bo bibîranîna canê paqij yê Şehîdên rêya azadiyê dest pê kir. Piştre birêz Husên Nazdar, Endamê Komîteya Navendî û berpirsê Komîsyona Lêkolîn û Perwerdehiya PDK Îranê, bi vê hincetê gotarek pêşkêş kir.

Di doma rê û resmê de rapora perwerdeya zandorê ji aliyê birêz Mêhdî Bedrî, endamê Komîsyona Lêkolîn û Perwerdeyê û yek ji mamostayên zandora han, pêşkêşî beşdaran bû.

Di beşeke din a rê û resmê de, ji aliyê helbestvanan Şerîf Felah(Hêja), Enwer Sultanpenah û Hesen Mehmûdî ve, çend helbest hatin pêşkêşkirin.

Her wiha peyama beşdarên zandorê ji aliyê Hoşyar Ehmedî, yek ji beşdarên zandorê ve hate pêşkêşkirin û piştre Mêhdî Bedrî, encama ceribînên zandorê eşkere kir û beşdarên serkevtî di wan ceribînan de bi beşdaran dan nasandin.

Hêjayî gotinê ye ku zandora han ku bi beşdariya bi dehan kesan ji Pêşmergeyên organên cur bi cur ên PDK Îranê birêve çû, roja 15.02.1386(05.05.2007)an, dest pê bû û roja 17.03.1386(07.06.2007)'an, bi dawî hat.

Vê zandorê waneyên weke Dîroka PDK Îranê, Dîroka Serhildanên gelê Kurd, Coxrafiya Kurdistanê, Mûdîriyet û birêveberî, Bermname û Pêrewa Hundirîn a PDK Îranê û Rênîşaniyên Karê Teşkîlatî û her wiha çend konferans jî weke Civaka Medenî(Sivîl), Siyasetên PDK Îranê, Demokrasî, Federalîzm, Dîplomasî û Basek li ser Ronakbîran, li xwe girtibûn.

Hewce ye were gotin ku rê û resm bi stranan û muzîkê ji aliyê Koma Hunerî ya Beşa Fîlm a PDK Îranê ve zêdetir hate xemilandin.

# Gerrek Kurt Di Dîrokê De ...

**Amadekar: Nûredîn Sofîzade**

***01.06:*** Roja Cîhanî ya Zarokan.

***01.06.1975:*** Yekîtiya Niştîmanî ya Kurdistanê damezrandina xwe îlan kir.

***02.06.1946:*** Di Îtaliyayê de bi hegera refrandomekê, piraniya xelkê deng dane hikûmetek demokratîk û hikûmeta dîktator ya **Mosolînî** têk çû.

***02.06.1965:*** Bi sedema bahozekî xurt li Hindistanê, pitir ji 35 hezar kes bûne qurbanî.

***02.06.1974:*** Welatê Malî li Afrîqayê serxwebûna xwe ragehand.

***02.06.1983:*** Cinayetkarên rejîma Komara Îslamî ya Îranê li doma cinayet û hovîtiyên xwe di Kurdistanê de, 59 ciwanên xelkê bajarê Mehabadê îdam kirin.

***03.06.1955:*** Pêkhatina yekemîn Konferansa PDK Îranê. Di wê komferansê de biryar hate dan ku divê partî pêwendiyên xwe tevî partiya Tûde qut bike.

***04.06.1989***: Xomeynî ku piştî şoreşa gelên Îranê di sala 1979'an de karî xwe wekî rêberê rejîma Îslamî li Îranê bisepîne û di heyamê desthilatdariya xwe de biryara cinayet û tepeseriya gelên Îranê û yek ji wan gelê Kurd dabû, mir.

***05.06:*** Roja Cîhanî ya Jîngehê.

***05.06.1953:*** Yekemîn civîna xelkê bajarê Mehabadê piştî jinavçûna Komara Kurdistanê pêk hat ku ji aliyê hêzên rejîma Şah ve kete ber êrîşê û kesek bi navê **Hesen Remezanî** bi sedema wê êrîşê şehîd bû. Ew civîn wekî civîneka mezin ya siyasî bû.

***05.06.1967:*** Şerekî dijwar û giran yê 6 rojî di navbera Ereban û Îsraîlê de qewimî.

***05.06.1977:*** Yekemîn kumpyotera malan ya bi navê "PC" ji aliyê şîrketa Epil hate çêkirin.

***05.06.1988***: **Rehîm Qerincî** fermande Lik, **Osman Ehmedî** Fermande Pel tevî 2 Pêşmergeyên din bi navên **Ebûbekr Mihemedî** û **Xalid Elahî** ji hêza Moînî şehîd bûn.

***05.06.1991***: Xelata Nobel ya Aştiyê ji Mixaîl Gorbaçof re hate dan.

***06.06.1987***: Pêşmergeyên PDK Îranê di 2 qadan de li devera Rebetê tevî hêzên rejîmê berbirû bûn. Di şerekî giran de ku derbekî dijwar ji dujmin ket û pitir ji 50 kesan jî kuştî dan, mixabin 4 Pêşmerge bi navên **Omer Sultanî**, **Simayîl Abdane**, **Qasim Elîzade**, **Ebdulaxaliq Ezîzî**, şehîd bûn.

***06.06.1992***: Yekemîn gera Parlemana Kurdistana Îraqê hate diyarîkirin û **Fuad Mesûm**, bo yekemîn Serokê Parlemanê û Roj Nûrî Şaweys bû cîgirê wî.

***07.06.1978:*** Xwenîşandana mezin ya xelkê Mehabadê, di rê û resmekê de seba veşartina termê **Ezîz Yûsifî**, piştre jî ev rê û resm bû xwenîşandan li dijî rejîma Pehlewî.

***08.06.2006:*** Serokê Girûpa terorîstî a El Qaîde, Ebo Moseb El Zerqawî, bi sedema bombarana esmanî ya hêzên Amerîkayê li bajarê Beqobê hate kuştin.

***10.06.2004:*** **Leyla Zana** û hevalên wê ku ji aliyê dadgeha Turkiyê ve, bi sûça axavtin bi zimanê Kurdî di Parlemana Turkiyê de bi 15 salan zîndanê hatibûn mehkûmkirin û pitir ji 10 salan bû ku di girtîxaneyê de bûn, serbest hatin berdan.

***11.06.1930***: Êrîşa leşkerên Turkiyê bo ser şoreşvanên **Agirî**. Piştî şerekî dijwar, mixabin Şoreşa **Ararat**ê têk çû û dawî bi vê şoreşê hat.

***11.06.1984:*** Hêzên rejîma Komara Îslamî ya Îranê êrîş birin ser devera Pesvê a derdora bajarê Pîranşarê û tevî berxwedana Pêşmergeyên PDK Îranê berbirû bûn. Di şereke tund û dijwar de ku tê de pitir ji 100 kes ji hêzên rejîmê hatin kuştin, mixabin 4 Pêşmerge bi navên: **Elî Omrî**, **Simayîl Yûsifî**, **Wahid Nîromend**, **Ebdula Îbrahîmî**, hatin şehîdkirin.

***12.06.2005:*** Parlemana Herêma Kurdistanê bi tevahiya dengan, rêzdar **Mesûd Barzanî** wekî Serokê Herêma Kurdistanê hilbijart.

***13.06.1979:*** Destpêkirina şerê Pawe û êrîşa berfireh a rejîmê bo ser Kurdistanê ku piştî vê bû bi şerê seranserî di Kurdistanê de.

***13.06.1999:*** Yek ji Fermanderên xweşmêr ê PDK Îranê bi navê **Mihemed Mistefayî**, naskirî bi **Heme Naristî**, Fermanderê Tîpa Navenda 2 ya Kurdistanê ji aliyê terorîstên Komara Îslamî ve hate şehîdkirin.

***13.06.2004:*** **Mamosta Mela Ebdula Ehemdiyan**, nivîskarê Kurd û zanayê olî koça dawiyê kir.

***15.06.1980:*** Veqetiyana taqima naskirî bi **Taqima 7 Kesî** ji PDK Îranê, piştî kongireya 4'an a partiyê. Partiya Tûde ew hay dabûn ku wî karî bikin. PDK Îranê jî ew karê wan bi îxanet zanî û şermezar kir.

www.arsivakurdi.org

# Hiqûqên Bingehîn, Rexne Û Şiroveya Qanûna Bingehîn Ya Îranê

**Beşa 2**



Seyîd Mihemed Qurdoyî Mîlan W; Dara Natiq
melanmohamad@yahoo.com

**Sedem Û Hegerên Peydabûna Taybetmendiyên Hevpar**

Sedem û hegerên peydabûnê: Bi lênihêrînek bi ser derbasbûyiya dîroka baskirî di beşa yekem de, em dikarin bibêjin ku hewcehiya neteweyên cur bi cur bi hebûna qanûna bingehîn pêka hegerên weke nediyarbûn û nepêwîstbûna çarçoveyên orfî bona îdarekirina civakê, zelalnebûna sînorên selahiyeta desthilatdar û maf û erkên xelkê, nediyarbûna çawaniya pêkanîna hêz û desthilatê û cîbicîkirin û guhertina desthilatê, nexuyabûna mekanîzma zêrevanîkirin bi ser desthilatê û çawaniya dîharîkirina kêrhatîbûna hilbijartin an danîna rêveberên civakê tê xuyakirin ku pêwîstiya hebûna yasaya bingehîn erê dipeçivîne û emê hewlê bidin ku vê çendê zêdetir şirove bikin.

**A) Nediyarbûn û kêmbûna azîn û qaîdeyên orfî ji bo rêveberiya civakê**

Welatên cur bi cur yên cîhanê di sedsalên derbasbûyî de li gor çarçove û yasayên orfî dihatine îdarekirin. Bi gotinek din îdarekirina her welatekê, pêka yasayên olî yên orfî ku ji aliyê desthilata hakim ve hatine darêtin û îdarekirin û guhertina hakiman û her wiha desthilatê, gellek caran dibû sebebê guherîna zaf yasayan ku ev çende jî dibû hegera pêkhatina bêewlehiya civakî, aborî û siyasî di civakê de.

Bi vî awayî, hebûna qanûnek ku sertir be ji îradeya kesên xwedî desthilat û dûr be ji guhertinên bingehîn di çarçoveya wê de, bi xurtî tê sehkirin.

Awayê nihêrîna xwedî desthilatan ji civatên xelkê û baştir hesibandina vîn û îradeya xwe ji tev qanûnekê û sehnekirina bi eyb û kêmasiyên xwe, yê bûye sebeba vê çendê ku bizava giştî ya civatên xelkê ber bi danîna qanûnekê ku tev eyb û girêpêçkên baskirî çareser bike, bê hêcet (pasaw) dihêle.

**B) Dîharbûna sînorên desthilata hakim û maf, erk û wezîfeyên xelkê**

Berî cîbicîkirin û danîna yasayên ku bi qanûna bingehîn hate navandin, hakimên welatan xwediyê desthilatekî bê sînor û nediyar bûn. Tu kesekê şiyana gotin û şirovekirina astê desthilat û maf û her wiha selahiyeta hêza desthilatdar nebûye, her wiha maf û çarenivîsa xelkê û hemwelatiyan jî nexuya bû û hertim dibûn goriyê guhertinan.

Di rastî de mirov dikare bêje ku di gelek rewş û zirûfan de, kesayetî û orfê siyasî û desthilatdarên hakim, çarenivîsa civakê û xelkê wê diyarî dikirin û bi guhertina rêbrên civakê, guhertinên bingehîn di maf û çarenivîsa xelkê de tê pêkanîn û ev çende jî dibe sedema pêkhatina nediyarbûna çarenivîsa siyasî û sergêjiya civakî a nifş û tex û qatên cur bi cur yên civakê. Rizgarbûn ji vê rewşê cuda ji darêtina yasayekê ku bi hûrî bi dîharîkirina hed û sînorên maf û erkên rêberan û çîn û qatên civakê cîbicî bike, derfeta cîbicîkirina wê tune bûye, lê ev biryar weke hegera xurttirbûna bizavên siyasî yên civakê ber bi destveanîna qanûna bingehîn tên hesibandin.

**C) Diyarnebûna çawaniya pêkanîna hêz û desthilatê û cîbicîkirin û veguhestina wê**

Bidestxistina hêz û desthilatê û veguhestina wê bi kesek din di civakên cur bi cur de, rastî şer û xwînrijandin û pêşveçûnên netewî hatiye. Piştî mirina rêber yan hakim, gerek din ji alozî û pevçûn û xwînrêtinê di nevbera zarok û diyarîkirina kesekê/a li devsa hakimê mirî de dest pê dike. Bi vî awayî guhertina desthilatê xwe ji tu zabiteke diyarîkirî nediparast.

Bi vî awayî, dîroka welatên cur bi cur, hertim qala şerên herêmî û qirkirinên bê rade ên xelkê dikir. Ji ber ku zana û pirsoprên cîhanê di serdemên cur bi cur de, di hizra avakirina bingehekî taybetî û hiqûqî û siyasî bo pêkanîna desthilatê û guhertina wê bi kesên diyarîkirî bo heyamekî kurt û her wiha veguhestina wê bi awayekî aştîxwazane bi kesekê/î din piştî bidawîhatina gera wî/ê a diyarîkirî yan jî piştî mirin û paşdekêşana wî/ê kesî/ê ji desthilatê de bûn û metodên cur bi cur li gorî rewş û zirûfa civakî û çandî û kultura civaka xwe pêşniyar dikirin.

**D) Giringiya mekanîzma zêrevanîkirin bi ser desthilatê**

Cuda ji çawaniya pêkanîna desthilatê, arîşeyeke din jî hebû ku ew jî çawaniya çavdêrîkirin bi ser kiryarên kesên xwedî desthilat de bû. Di rastî de xisleta zêdexwaziya mirovan ji aliyekê û xwestina parastin û qahîmkirina desthilata xwe ji aliyeke din ve, dibe hegera kêmbûna zêrevanîkirin bi ser kiryarên hikûmî di navbera xwedî desthilatdaran de. Yek ji kêşmekêşên hizrî yên dijberiyên civakê, avakirina binkeyên zêrevnî yên cur bi cur bo zêrevanîkirin û kontrolkirina dezgehên birêveberî û çawaniya diyarîkirina hilbijartin an danîna berpirs û birêveberên derece bilind yên dewletî ye.

Yek ji kirîzên herî girîng ku rastî civakên cur bi cur bûye û heta di zaf welatên cîhanê de, piştî vê çendê ku ji qanûna bingehîn mifah wergirtine û heya niha jî heye, mijara çawaniya hilbijartin yan danîna berpirs û rêveberên civakê ye. Di rastî de yek ji hegerên herî girîng yên serhildana tevgerên civakî ên siyasî di navbera neteweyên cur bi cur de, nerazîbûnên giştî ji kiryarên rêber û desthilatdarên xwe bûye.

www.arsivakurdi.org

# Zarokên Îranê Bêpar Ji Cîhaneke Hêjayî Jiyana Xwe

**Hemîd Muxtarî**
**tishk_ronahi@yahoo.com**

Piştî pesendkirina Peymannameya Cîhanî a Mafê Zarokan di sala 1989’an û birêvebirina wê di sala 1990’an de, bona rêzgirtin ji zarokan û dabînkirina mafên wan, ji aliyê gişt welatên cîhanê roja 1’ê Hezîranê, weke **Roja Cîhanî a Zarokan** hate diyarîkirin. Îro rojê di nava 193 welatên cîhanê de, 191 welatan ev peymanname û birêvebirina wê pejirandine. Peymannameya Mafê Zarokan yekemîn peymannameya navneteweyî di dîrokê de ye ku bi awayekî bilez ji aliyê piraniya welatên cîhanê hate piştevanîkirin û pejirandin. Ev yeka nîşaneya vê çendê ye ku piraniya netewe û dewletên cîhanê bi armanca pêkanîna cîhaneke bêtir bona zarokan hevdeng in.

Rejîma Komara Îslamî a Îranê jî di meha Adara sala 1993’an de, bi danîna şert û mercan, ev peymannameye pejirand. Lê bi rastî rejîma Îranê di birêvebirina madeyên vê peymannameyê de micid e û diparêze?!

Emê li jêr, bi anîna çend mînakan ji madeyên peymannameya han bona selimandin vê çendê ku rejîma Îranê tenê bi merema xapandina raya giştî a cîhanê bûye endamê vê peymannayeyê, dê nivîsara xwe bidomînin.

Yek ji wan mînakan, madeya 32’an ya Peymannameya Mafên Zarokan e ku dibêje: “Divêt Zarok li hember her karekê de ku gefê ji geşekirin û saxlemiya wan dike, bihên parastin. Dewlet divêt temenê kar û rewşa zarokan diyarî bike”.

Lê mixabin em dibînin ku di Îranê de, bi hezaran zarokên heta bin 10 saliyê de jî di şeqam, zeviyên cotkariyê yan kargehên ristina mafûran û... de bona bidestveanîna debara jiyanê mijûlê karkirinê ne, yan têne îstîsmarkirin û dibine goriyê rewşa civakî, aborî, malbatî, çandî û bijêva jiyana xwe. Pêka serjimêriyên nû, pitir ji %80 ya zarokên rêgehan zarokên şolê ne.

Yan madeya 7’an ku dibêje: “Her zarokekê mafê vê çendê heye ku bibe xwediyê nav û nasnameya xwe ya taybet a neteweyî”. Lê mixabin di Îrana bin desthilata rejîma Komara Îsamî de, divêt navên ku bo zarokan tên hilbijartin, Farsî û



Îslamî bin. Diyare li vir merem ji Îslamê tenê ola Şîiyên 12 Îmamî ye. Bi vî terzî zarokên Kurd hem di warê neteweyî û hem di warê olî ve dikevin ber ferq û cudahiyan.

Di madeya 27’an de hatiye ku: “Her zarokekê mafê vê çendê heye ku di warê cendekî,hiş, ruhî û civakî de pêş bikeve”. Lê li gor gotina Dr. Mihemed Hesen Îmamiyan, cîgirê saxlemî û dermanî yê Zanîngeha Zanista Nojdariyê, pitir ji %50 ji zarokên bin 5 saliyê di Îranê de, ji xwarineke hewce û baş bêpar in û pêre dinalin û kêmbûna wê dibe sebebê zû mandîbûna zarokan, jêrdeçûna astê pêşkevtina xwendewariyê û astengeke li hember xurtbûn û geşekirina aborî û çandî a welatê me.

Di madeya 37’an de hatiye: “Çi zarokek nabe bikeve bin îşkence û riftarên zalimane û girtinên ne yasayî. Dasepandina cezayên îdam û hepsa hertimî divêt derheq zarokan de nemîne û bên hilgirtin”.

Yan madeya 19’an ku basê nehêlana riftarên xirab bi nîsbet zarokan dike û dibêje: “Erkê ser milê dewletê ye ku li hember her cure liv riftareke nebaş ya dê û bavan yan jî serperestan li hember zarokan, raweste û zarokan biparêze û bona pêşîgirtin ji her cure mifahwergirtineke xirab ji zarokan, kiryarên hewce ên civakî encam bide”.

Lê bi rastî rejîmek ku bi xwe piropagenda çanda şer û tund û tûjiyê di xwendingeh û dibistanan de dike, hêzên ewlekarî û întîzamî di rêgeh û parkan de xelkê didin ber lêdanê û biryara şelaq û lidarvekirinê li hember çavên xelkê birêve dibe, riftarek ku bandora neyinî li ser zarokan û riftara civakê didanê, çawa dikare zarokan ji tund û tûjiyê biparêze?!

Rejîmek ku bi xwe sîstemeke tund û tûj e, bê şik nikare zarokan li hember tund û tûjiyê biparêze.

Eva tenê çend mînakek ji madeyên Peymannameya Mafê Zarokan bûn ku rejîma Îranê gellek bi rohnî binpê dike. Heke em bixwazin li ser tev madeyên peymannameya navhatî biaxivin û çawaniya birêvebirina wan di Îrana bin desthilata rejîma Îsamî de şirove bikin, bê şik ne tenê bi nivîsarek wiha kurt kuta nabe, belku zêdetirî çend pirtûkan cî digire.

Di encamê de, divêt em bibêjin ku rejîma Îranê tenê bona lêbandina raya giştî a cîhanê yê bûye endamê Peymannameya Mafê Zarokan û dixwaze rûçikeke demokratîk yê rûyekî ji xwe nîşan bide û bi vî terzî xuya dike ku rêz ji bo mafê zarokan digire û girîngiyê dide wan. Lê di bingeh da tu soz û berpirsiyariyekê derheq vê peymannameyê ji xwe nîşan nade û bi awayekî pir hovane mafê zarokan binpê dike û heya niha bi sedan zarokên bin 18 saliyê, li hember çavên xelkê îdam kirine, yan xistine girtîxaneyê yan îşkence kirine.

Tenê di sîstemeke demkratîk, xelkî û berpirsiyan û mirobpwere de ye ku zarok dikarin bibin xwediyê cîhaneke hêjayê xwe.

# Cejna Mezin Ya Zarokên Sirgûnê, Di Roja Zarokan Ya Cîhanî De

Bi boneya 1’ê Hezîranê, **Roja Zarokan ya Cîhanî** di bin dirûşma “**Cîhanek Hêjayî Zarokan”** bi beşdariya zaroyên hemû navendên Kurdistanê û bo rêzgirtin ji maf û xwestekên zarokan, bi alîkariya Deftera Siyasî ya PDK Îranê, ji aliyê belavoka “Dinyay Mindalan” (Dinyaya Zarokan) ve, êvariya roja înê, 1’ê Hezîrana 2007’an, li Dibistana destpêkî ya Azadî’yê, rê û resmek di bin navê “**cejna mezin ya zarokên sirgûnê”** hate lidarxistin.




Di serî de rêzdar Têmûr Mistefayî, endamê Deftera Siyasî yê PDK Îranê, peyama Polîtbîroya PDK Îranê bi vê boneyê ve pêşkêş kir. Birêz Têmûr Mistefayî tevî destnîşankirina mafên zarokan di nava civakê de û binpêkirina mafên wan nemaze li Kurdistana Îranê û girîngîdan bi maf û xwestekên zarokan û şêwaz û awayê perwerdekirina zarokan di nava civaka Kurdî de, amadebûna Deftera Siyasî ya PDK Îranê bo her cure xizmetekê di warê zarokan de îlan kir.

Piştre Peyama Desteya Birêveber ya “cejna mezin ya zarokên sirgûnê” ji aliyê Ejîn Behramî ve pêşkêşî beşdaran hate kirin. Li pey re Gelawêj Mêhfer’ê payama zarokên sirgûnê xwend.

Di vê cejnê de çendîn sirûd, stran û govend tevî pêşbirkêya mastxwarinê, şimtîxwarinê û nigarkêşandin û poldifankan di nava hez û xweşiya berfireh û bêrade ya zarokan bi bedewî hate pêşkêşkirin.

www.arsivakurdi.org

# Xurtbûna Diyardeya Xwezokiyê Li Bajarê Seqizê De

Diyardeya xwezûkiyê bûye sebebê kirêtbûna rûçikê bajarên Kurdistanê û yek ji wan bajarê Seqizê. Pêvajoya xurt ya zêdebûna nifûsa bajarî û zêdebûna hejmara akinciyên kêleka bajaran, rewşa nebaş a aborî û bêkariyê, ku di encama siyasetên biqirêje rejîma Îranê di Kurdistanê de pêk hatiye,yê bûye sebebê xurtbûna berçav ya xwezûkiyê di piraniya bajarên Kurdistanê û yek ji wan bajarê Seqizê.

Piraniya kesên xwezok ku ji jin, zarok û kesên tûşbûyî bi madeyên sirker pêk hatiye, li ciyên giştî û qerebalix ên bajaran de weke bazar, termînal, nexweşxane û li hember mizgeftan ji rêya lahîkirinê û heta girtina kincên kesên ku li wir de hatin û çûnê dikin û herwisa bi çûna di nava malan de, daxwaza dirav û hevkariyê dikin.

Kesên xwezok xincî vê çendê ku dibine sebebê pêkhatina kêşeyan ji bo



xelkê û kirêtkirina rûçikê bajaran, belku dikarin bibine sebebê xurtbûna fisada exlaqî û kirîzên weke tûşbûn bi madeyên sirker û berfirehbûna nexweşiyên giştî.

Hêjayê gotinê ye ku hindek ji karnas û pisporên civakî eger û sedema berfirehbûna diyardeya xwezokiyê vedigerînin bo xizanî, sistbûna bingehên malbatî, nebûna rêxistinên hewce bona dabînkirina dada civakî, koçkirinên bikom yên xelkê bo bajaran û jêrdebûna astê saxlemiyê.

## Mêrê Ku 9 Jin Û 95 Zarokên Wî Hene, Dixwaze Jina 10’emîn Jî Bîne

**Hacî Garis Xelef** ku weke Hacko tê naskirin, niştecihê Girzerike, li Başûrê Çiyayê Şengalê ye. Ew di sala 1957’an de ji dayîk bûye. Hacko dibêje, di çend rojên pêşiya me de, ew dê jina 10’emîn jî bîne.



Di sala 1974’an de, cara yekemîn bavê wî jinek ji wî re aniye, ji ber ku ew jina ne bi dilê wî bû, wî di heman rojê de çû ji xwe re jinek anî û wê rojê du caran bû zava...

9 jinên wî hebûn, yek çûye ser dilovaniya xwe, yek berdaye, 7 jina niha bi wî re dijîn!

Hacko (bavê Cemal) dibêje di navbera 90 – 100 zarok û neviyên wî hene, niyeta wî heye jina 10’emîn jî bîne.

Wî li mala xwe dibistanek bi navê Newroz vekiriye.

***Jêder; Rojnameya Evro***

## Dewleta Îranê Di Lîsteya Reş Ya Qaçaxa Mirovan De



Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê îsal jî di rapora salane ya xwe li ser rewşa bazerganiya bi mirovan bi berfirehî sekinî û navê 16 welatan jî di rapora sala 2007’an de cih daye.

Îran, Koba, Erebistana Seûdî, Sûriye û Ozbekistan her wekî salên berê di lîsteya reş de mane. Herweha Behreyn, Qeter, Oman, Malizî, Elcezayir û Gîne jî ku zaf ji wan hevalbendên Amerîkayê ne, bi vê lîsteyê zêde bûne. Ku tu gavek di xebata li dijî qaçaxa mirovan de ne avêtine.

Li gorî wê, her sal 800 000 kes di cîhanê de têne kirrîn û firotin ku %80 ji wan keç û jin û nêzîk bi nîviya wan ji zarokan pêk tê.

Li gorî vê raporê jinên Îranî ji bo mifahwergirtina cinsî bo welatên weke Mîrîtiyên Yekbûyî yên Erebî, Qeter, Kuweyt, Pakistan, Turkiye, Fransa, Almanya û Birîtanyayê têne qaçaxkirin.

## Yekîtiya Ciwanên Demorat Ên Kurdistana Îranê Kongireya Xwe Ya Çaremîn Lidar Dixe

**Bangewaz:**

YCDK Îranê di pêxema pêkanîna civakeke azad û demokratîk di Îran û Kurdistanê de dixebite ku tê de rêz ji mafên mirovan û azadiyên bingehîn were girtin.

Beşdarî di tevgera rizgarîxwaziya neteweyî – demokratîk a gelê Kurd di Kurdistana Îranê de û piştevanîkirin ji bizava demokratîk a gelên Îranê, yek ji armancên herî sereke yên YCDK Îranê ye. Ji ber vê çendê ye jî ku erkê her ciwaneke şoreşger ê Kurd e ku prede li ser siyasetên dijî gelî yên Komara Îslamî derheq ciwanan û tex û qatên din ên civakê, hilde.

Her weke ku di bername û pêrewa YCDK Îranê de hatye, ew rêxsitine her du slan carekê ji bo şiroveirina pirsgirêkan, guhertinên herêmê, Îran, Kurdistan û Cîhanê û her wiha pêdeçûna bername û programa xwe ya hundirîn, kongireyên xwe lidar dixe. Ji ber wê çendê ye ku bi zûyî dê kongireya çaremîn a YCDK Îranê were lidarxistin.


Daxwaz ji hemû endam, alîgir û ciwanên biemeg û welatparêz ên gel eva ye ku heke her cure rexne, gazinde, pêşniyar û têdîtinek li ser bername û pêrewa hundirîn a vê rêxistinê û her wiha çawaniya kar û barên kongireyê û pêşdeçûna YCDK Îranê hene, bi nav û nîşaneyên jêr de hatî re pêwendiyan bigirin:

**info@lawanweb.com**
**dara_natiq@yahoo.com**
**lawan.kurdistan@gmail.com**

**Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê**
**Komîteya Birêveberiya Giştî**

www.arsivakurdi.org

# RONESANS



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Domana feraset û ramana ronîbûnê, di dîroka mirovahiyê de xwediyê cihekî pir girîng û manîdar e. Ev doman, bingeha xwe ji fikr û ramana ramanwerên *Yewnaniya Kevnar* digire. Bizava ronîbûnê, di navbera sedsala 17 û 18'yan de li Ewropayê rû dide û dibe riknê şoreşa felsefî, hunerî û ramyarî. Fikra ronîûnê derbeyeke pir mezin li bawerî, ferset û ramanên derezanistî û kevneperest dide. Û ev ramana nû dibe despêka hişmendiya dîrokî û hemû zanyariyên gerdûnî.

Ronesans, li erdnîgariya Ewropayê dest pê kiriye û li tevê cîhanê belav bûye. Belê gava ku mirov dêhna xwe dide erdzemîna Asayayê, mirovên vê erdnîgariyê, fikr û felsefeya ronesansê zû bi zû ne pejirandine. Û her wiha car caran jî li hember wê derketine. Ev yek jî bûye sedema lipaşmayîna civat û civakên Asayayê û mirovên erdzemînên paşmayî yên din. Di dem û domana ronesansê ya ku wekî "nû dîtinekê" dihate dîtin de, ramanwerên ku di serdema seretayî de jiya bûn, di serdema navîn de jî dihatin nasîn. Belê heta wê demê pirtûkên wan (yên ku bi destan hatibûn nivîsandin) di refan de diriziyan û tu kesî guh nedida raman û felsefeya wan. Nirxdayîn û qedirşînasiya ramanwerên nû û kevnar, bi ronesansê dest pê kir û gihîşt merhaleyeke payedar. Ev yek jî bi saya qîmetdayîna çand, huner û wêjeyê gihîşte vê merhaleyê.

Dîroka mirovahoyê dîroka şaristaniyan e. Mirovahiya ku şaristaniyên kevn û nûjen afirandiye, bi naskirina gerstêrka me( erdzemîna ku em li ser dijîn) nehatiye ser; her wiha bi guherîn û veguherîna xwezayê û jêsûdwergirtina wê jî mijûl bûye. Pêwendiya bi xwezayê re li derê ha; êdî mirovahî ketiye nava tevgera dahûrandin û nasîna fezayê û li wir bicî bûne. Cîhan û mirovahî bi dahên û nûvedaniyên nû nasdar dibe.Ji bo mayîndebûna jiyana fîzikî tê dikoşe û bêrawestan li çaredîtina mirinê dicehdîne. Ev yek nîşana şoreşa hişmendiyê ya ku zanîn û teknolojiya nûjen pêk aniye. Şoreşa hişmendiyê jî nîşana ronesansa nûjen û destpêka şaristaniya mirovahiyê ya nûdem e.

Her mirovê ku bi karê nivîsê eleqedar dibe û her wiha li ser çand, huner û wêjeya gel lêkolîn û dahûrandinê pêk tîne, her gav nikare bibe ronakbîr. Dibe ew kes wekî rewşenbîr bê dîtin belê her gav nikare bibe şayanî ronakbîriyê. Ronîbûn, ji hêla sosyolojîk ve; tê wateya hewldana têgihîştina rêbazên xwezayê û edilandina pergalên dinê ku mirov bi hişmendî û ceribandinên xwe bidest dixe. Ji kesên ku vê yekê wekî rêbaz û azîne dineqîne re ***ronakbîr*** tê gotin. Ronakbîr ew kes e ku xwe ji bin bandor û bindestiya hemû tirs, saw, darazî, pêşdarazî, paşmayîn, kevneşop û paşverûtiyên demê yên kevnar û îroyîn reha dike. Ronakbîr ew e ku ne bi hestyarî; bi pejnkarî û bîryarî tevdigere. Ronakbîr ew e ku ji hemû kevneşopî û kevnerûtiyên kambax û bêyom bidûr dikeve û arasteyî zanîn û zanyariya ramanwer û pisporên dinê yên nûjen dibe. Lewre ronîbûn her gav xwe dispêre vîn û hişmendiya mirov a azad û serbixwe. Ronakbîr bi xwe jî şagirt û berdevkê vê hizirîn û ferasetê ye. Ew, nikare wekî murîd û bawermendekî/e kevneperest tevbigere û bibe dîl û destgîrê baweriyên xwe. Ew, rêçenas û şopgerê zanîn û zanyariyê bi xwe ye. Yanî, ronakbîr neçar e ku ji baweriyên xwe bêtir bi zanîna xwe tevbigere û bi bîr û bîrdoza xwe re lihev be. Helwest û bertekdariya wî/wê jî her gav di vê çarçoveyê de teşe digire û li ser vî riknî bilind dibe. Ev yek, rasterê dibe egera hebûna û peywira wî/wê ya ser rûyê dinê û her wiha binbarî û berpirsiyariya wî/wê ya mirovî.

Ronîbûn, wekî nêrîneke nû ya lihemberderketina ramana Serdema Navîn tê zanîn. Taybetmendiya ronîbûnê ya herî girîng, ahengdariya navbera hiş û xwezayê û her wiha girêdayî wê jî lihevkirin û lihevhatina mirov û xwezayê ye. Bêşik, hiş û hişmendiya mirov û têgihîştina wî/wê ya îroyîn jî ji bo vê yekê gelekî guncan û bikêrhatî ye. Belê dîsa jî hewcetî bi cehd û hewldanên mirov ên ku di riya zanîn û zanyariyê de têne xebitandin, heye. Lewre ronîbûn, qelaştina perdeyên reş û tarî yên stûr e ku, di navbera mirov û zanînê de hatiye danîn. Ronîbûn, qetandina tovil û çermê ser mêjiyê mirov û mirovahiyê yê ku bi hezaran sal ew wekî lewirên hov û kovî, bê hizirîn û fikirîn hiştiye û berdaye dinê. Ronîbûn, parçekirina goga risasî ya ku her gav bi gefxurî li ser serê mirov û mirovahiyê hatiye daleqandin. Ev goga risasî wekî şûrê seqakirî yê Demokles, bi hezaran sal bi ser serê mirovahiya cîhanê de bênavber dilolibe.

Ronîbûn, tirs û sawa dilê hemû hêzên reş û tarî û hêzdariyên bêrê û nehênî ye. Bi kurtayî ronîbûn, tîrêja jiyanê ye. Bêdeng û bêwext, xwe berdide nav şane û cestê mirina sar û rih û giyana mirov û mirovahiyê ji nûve vedijîne.

Kaniya Helbestan

## Kuştiya Evînê



Serbest Urmiye

*Di hêla esmanê şîn*
*Ê bêrûmetê cararan de*
*Nizanim*
*Di bin siya kîjan evrî*
*Di xew de mabû dîsan*
*Xwedê,*
*Li meydana gund,*
*Ji sîngek evîndar*
*Bilind dibû*
*Qîrênek bêgazî*
*Dikuştin ew*
*Xwedî wijdanên bêwijdan*
*Li ser navê olê xwedê,bi*
*fermana şêx*
*Lêdixist,*
*Tawûsê gunehkarê melik*
*Bilûra kuştinê*
*Û*
*Kerr dikirin,*
*İblîsê mezinê şer*
*Guhên wijdanê*
*Weke caran*
*Dîsan nexuya bû ji çi erdan,*
*Xwedê*
*Bêgazî û hêvî dengê evînê*
*Mabû di sîng de û*
*Tewbê dixwestin jê*
*Lê ....*
*Nizanim bi kîjan sûçî û*
*Bo dergehê kê?*
*Melikê gunehkaran*
*An jî dergehê*
*Xwedêyê hertim di xew de mayî!*
*Ji kê bixwazin, tewbê*
*Di warekê de*
*Ger, sûçek hebe*
*Û*
*Ew jî evîn*
*Betal kin êdî*
*Mizgeft û Dêran*
*Bo çine me*
*İncîl û Tewrat û Quran*
*Ku sûç evîn be û sûçdar evîndar,*
*Bê xwedêtî ye*
*Oldarî û*
*Xwedê peristî jî guneh e*

www.arsivakurd.org

**Nîlufer Akbal:**

# "SIYASET YÊ BÛYE BELA SERÊ HUNERA KURDÎ"

***Li ser rewşa stran û mûzîka Kurdî em heya niha bi çend hunermendên dengxweş ên Kurd re peyivîne. Di vê hejmara Agirî de jî em dê rewşa muzîk û strana Kurdî û nemaze rol û beşdariya jinên Kurd di qada huner û muzîka Kurdî û astê pêşdeçûna vê hunera zengîn di hevpeyvînekê de tevî hunermenda dengzelal Nîlufer Akbal ku ji bo çêkirina kilîpekê seredana Başûrê Kurdistanê kiriye, bişopînin.***

**Hevpeyvîn/ Dara Natiq**



**Hunermend Nîlufer kê ye?**

Nîlufer Akbal ji malbatekî welatparêz, li bajarê Warto a ser bi parêzgeha Dersimê, hatiye dinê. Nîlufer xwediyê 5 xûşk û 2 birayan e. Xwendina xwe ya destpêkî û navendî heta lîseyê li bajarê Warto kuta kiriye. Piştre sala 1986'an diçe bajarê Stenbolê û sê salan li mekteba "Arîksa" di warê muzîka baqla, note û pertowarders xwandiye. Sala 1988'an, yekem albom xwe bi navê "Bîten Elewiyan" çê kir. Wê tevî zaf hunermend û muzîkjenên bi nav û deng yên Kurdan weke: Ehmed Kaya, Ferhad Başqal, Yosif Kaya Oxlu û ... re konsert û pirogramên hunerî pêşkeşî gel kirine. Nîlufer piştî çend salan kar û têkoşîna hunerî li Stenbolê, berê xwe dide welatê Fransa û wêderê tevî muzîkvanê navdar yê Fransî, Dr. Jan Mîşêr Kenêr re nasyar dibe û albûma bi navê **Rêvîng** çê dike. Ew piştre diçe welatê Almaniya û çar salan di warê muzîkê de dixwîne. Nîlufer Akbal heya niha di zaf festîval û konsertên cîhanî de pişikdarî kiriye û serkevtinên gellek mezin bi dest anîne.

**Çawan û kengê bû ku tu tevlî cîhana hunerê bûyî?**

Ez 8 salî bûm dema ku min xwe fam kir û biryar da ku ez bibim hunermend. Ji ber ku muzîk hertim di xeyalên min de dilivlivîn. Wê demê were heya niha, her tiştê min li ser hunerê bûye. Min cuda ji hunerê çi karek din ji xwe re nekiriye. Ez heya ku li bajarê Warto bûm, hertim li ser sehnan stran digotin.

**Ew kesên ku piştgirî ji hunera te dikirin û bi her awayekê bandor li ser hunera te hebûn, kê bûn?**

Sûsena dayîka min, Elî Ekberê birayê min, gelê me yê Warto, hu nermend Ehmed Kaya, Ferhad Başqal, Hesret Portekîn, Radyoya Erîvanê, Miryemxan, Eyşeşan, Mehmîd Tûncer, Belqîsa Kaler, Şivan Perwer, Civan Haco, Cigerxwîn, Ehmedê Xanî, Tehsîn Taha, Mihemed Arif Cizravî, hemû ewane ji hunera min re

## MİXABİN ME HEYA NİHA NEKARİYE Bİ AWAYEKÎ HEWCE Û ÎROYÎ MUZÎKA KURDÎ PÊŞ BÊXİN Û BİGEHÎNİNE ASTEKÎ NAVNETEWEYÎ

xwedî bandor bûn.

**Malbat û kultura Kurdî yek ji astengên herî mezin li hember tevlîbûna jinan di warê huner û muzîkê de bûne. Gelo tu heya çiqasekê di warê hunerê ve ji aliyê malbata xwe ve serbest bûyî?**

Malbata min bi min re pir harîkar bûn. Ez 18 salî bûm dema ku babê min çû ber dilovaniya Xwedê, wê demê ez pir perîşan bûm. Dayîka min wê demê gote min Nîlufer baweriya min bi te heye, baweriya min bi dengê te heye, here Stenbolê mekteba xwe bixwîne û rêya xwe peyda bike. Eger dayika min îzna min nedaba, min nedikarî ez bibim hunermend. Lê ez dibêjim ku malbat çiqas baweriyê bi evladê xwe bîne, evlad jî ewqas harîkiriya malbasta xwe dike û dikare baştir rêya xwe peyda bike.

**Nîlufer, bi baweriya te çima jinên Kurd nekarîne bi awayekî hewce beşdarî huner û muzîka Kurdî bibin?**

Sipas ji te re, bi rastî pirsek balkêş bû. Lê bi baweriya min xala herî girîng eva ye ku huner û muzîka Kurdî hertim bindest bûye, anku huner hertim di bin rikêfa partî û siyasetvanên Kurd de bûye, zulm û zorî, bindestî, kultura Kurdî û.... herwiha hertim ji jinan bo karê sêks û zarok çêkirin û karê nava malê mifah jê hatiye wergirtin. Ewane û gellek sedemên din ên berçav bûne astengên mezin li hember pêşveçûna jinan di her warekê de.

**Dibêjin Nîlufer xanim ne zewiciye û naxwaze di pêşerojê de jî bizewice, Çima?**

Belê rast e. Ez bi muzîkê re zewicî me, muzîk jiyan, ruh û dilê min e, eger muzîk nebe, ez jî mirî me. Ez bi muzîkê re rihet im, muzîkê guhdarî dikim, sazê lê didim, lê dema ku mirov mêr kir, nikare bi keyfa xwe be, zarok mirov girê didin, wê demê dibe ku tu xizmeta mala xwe de bî. Salên min jî derbas bûne, niha îdî ez dixwazim kar bikim, dixwazim harîkariya hunera Kurdî bikim, xizmeta gelê xwe bikim.

**Weke tê xuyakirin, te piraniya jiyana xwe ya hunerî li Stenbolê derbas kiriye, tu li wêder fêrî çi bûyî?**

Dema ku ez çûme Stenbolê û tevlî huner û muzîkê bûm, min xwe nas kir, û min zanî ku ez Kurd im. Ez fêr bûm jin çi ye, piroblemên jinan çi ne, û yanî dibêjim cinsiyeta xwe nas kirin, ez fêr bûm siyaset çi ye, Kurdayetî çi ye? Ez her tiştekê li metropolên Stenbolê fêr bûm.

**Gelê me yê Bakûrê Kurdistanê, heya çiqasekê di warê huner û muzîka xwe de serbest in?**

Dewleta Turkan hertim siyaseta asîmîlekirina Kurdan weke yek ji stiratêjiyên nemirovane yên xwe piraktîze kiriye. Muzîk û hunera Kurdan hertim bindest bûye. Turkên faşîst hertim cehda dizîna çand û muzîka Kurdî kirine. Lê esasa me di wir de ye ku dema gelê me yê Kurd bi hevre teba bin û harîkariya hunermendên xwe bikin, wê demê me hewceyî bi radyo û televîzyon û

www.arsivakurd.org

hevkariyên Turkan nine. Lê em bi xwe dujminê hev in, eger partî û siyasetvanên me alîkariya te nekin, mirov ser nakeve. Ez dixwazim hunermenda çar parçê Kurdistanê bim. Naxwazim yek hunermend û yek siyaset û yek partî bim. Di bingeh de, huner bi ser siyasetê ve ye. Lê di bakûr de jî bindestî berdewam dike, qedexeyî berdewam dike, kompaniyên Turkî harîkariya hunermendên Kurdan nakin. Dibêjin ku kilîpên Kurdî di televîzyonan de nahên nîşandan û ji mere ne qazance.

**Nîlufer, dema ku mirov guhdarî muzîk û stranên Kurdî dike, tevlîhevbûnek di navbera muzîk û strana Kurdî û biyaniyan û bi teybetî muzîka Turkî de tê xuyakirin, hûn vê çendê çawan dinirxînin?**

Muzîk bê ziman e, zimanê muzîkê tune ye. Muzîka cîhanî jî dikare bandorê ji hev bike, bona pêşveçûna muzîka xwe. Lê dema ku te dewleta xwe hebe, edebiyat û zimanê te hatibe naskirin, edebiyata te cihê xwe girtibe, muzîka te cihê xwe girtibe, rengê xwe hebe, Piştre tu dikarî vê tevlîhevbûnê bikî, lê ez niha vê tevlîhevbûnê bi hewce nizanim, ji ber ku ev ne karê me ye, ne karê genca ye, eva karê karnas û pisporan e.

**Bi baweriya te huner û muzîka Kurdî heya çiqasekê pêş ketiye?**

Baweriya min bi hunera Kurdî gellek e. Lê mixabin me heya niha nekariye bi awayekî hewce û îroyî vê hunerê zengîn pêş bêxin û bigehînine astekî navneteweyî. Lê mixabin siyaset yê bûye belaya serê hunera Kurdî. Esasa hunera Kurdî ne li ser sehnê ye. Kêmasiya şîrketên berhemanîna muzîka Kurdî heye. Di nava cîhanê de huner û muzîka Kurdî ne diyare, nehatiye naskirin, kerema xwe bila hikûmeta Kurdî harîkariya hunermendan bikin. Bila Wezîrê Çandê hunermend be, ji ber ku ev baştir ji hunerê fam dikin. Bila bê farq û cudayî ji tev hunermendan re reklam bihê kirin. Divêt siyaseta Kurdî hertim piştevaniyê ji hunermendan bike û ....

**Nêrîn û baweriya te derheq roj bi roj zêdetirbûna hunermend û stranbêjên Kurd çi ye?**

Gellek sipas dikim, bi rastî eva pirsekî hewce bû. Tu dizanî ez demokrat im, her tiştekê dibînim û dibêjim, yanî fam dikim ku Kurdistan ji nû ve çê bûye. Her tiştek ji nû ve dest pê kiriye, yanî her tişt niha tevlî hev e, piroblem pir in, pirsgirêkên muzîkê jî pir in. Gava mirov televîzyonê temaşa dike, her roj gencek stran gotiye. Muzîk çê kiriye, kilîp çê kiriye, dema ez rê diçim, hin kes min dibînin, dibêjin Nîlufer tu xêrhatî Kurdistana azad, tu dizanî ez jî hunermend im! Dibêjim hala hala... , bo? Nizanin huner çi ye, ez bi xwe nikarim bêjim ku ez hunermend im, ji ber ku ez ketim ser rêya hunerê û dixwazim bibim hunermend, hunermendî ne tenê deng xweşî ye, ne tenê muzîk lêdane, dema mirov huner dest pê kir, gerek mirov bizane huner çi ye, baş hunerê fam bike. Bixwîne, akadîmîk fêr bibe, daxwaza min ji gencaên ku taze dixwazin têkevin nava hunerê eva ye ku eger dixwazin harîkariya hunerê bikin, diviya di pêş de bizanin ku huner çi ye, fêr bibin, gava ku mirov albûmekê çê dike, ew albûm di dinyayê de tê belavkirin, bila albûm baş be, bizane ku çi stranekê dibêje, bo çi dibêje, armanca wî/ê çi ye, bizanibe ku mesela Kurdan çi ye, muzîka me hertim bindest bûye, hunermendên me perîşan û bindest mirine, muzîka me winda bûye, hunera me winda bûye, yanî gava ku ew kesane hemû ewane bizanin, wê demê ji xwe şerm dike ku vê yekê bike.

**Çawan bû ku tu hatî Kurdistana azad?**

Ez hatim ku Kurdistana azad nas bikim. Bizanim ku gelo kêmasiyê wê çi ne, welatê xwe nas bikim, xwe bidim naskirin, ez dixwazim vê carê bi arîkariya Korek Telekomê, bo alboma xwe ya dawiyê bi navê "**şeva**" kilîbekê çê bikim.

**Hez dikim bizanim ku we heya niha çend berhem pêşkêşî gelê xwe kirine?**

Min heya niha 2 albûm bi Turkî, albûma **Newroz** 1-2, albûma bi navê **Ez û Hunermendên din, Dortêlwan**, **Mîro**, **Revîngî**, **Rayê** û **Şava** yanî li serhev 10 albûm pêşkêşî gelê xwe kirine.

**Armanc û pilanên we bo pêşerojê çine**?

Min albûmek nû dest pê kiriye, di albûma nû de, ez û Ayhan Êwcem em bi hevre kar dikin, albûma min Kurmancî, Soranî û Zazakî tevlî hev e, hêvîdar im ku bi dilê gel be.

**Hunermend Nîlufer, gellek sipas ku we dema xwe bi mere veqetand. Gotina we ya dawiyê ji bo gelê me çi ye?**

Ez jî gellek sipasê rojnama Agirî dikim. Sipas ji tev emegdarên Agirî û kargêrên Agirî re. Di dawiyê de, ji gelê xwe daxwazkar im ku ji axa xwe xwedî derkevin, ji huner û muzîk û kultura xwe xwedî derkevin, ji radyo û televîzyon, wêje û.... xwedî derkevin, bi hevre teba bin û bi hunermendên xwe re harîkar bin.



# "DAYİKA MİN Bİ XWE RÊYA XWENDİN Û HUNERÊ DA BER MİN"

www.arsivakurdi.org

agiri


**Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî**
**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne**

**http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php**
**Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.**
**Navnîşana derveyî welat:** AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

**E - Mail:**
**agiri2003@hotmail.com**
**agiri2003@googlemail.com**




# Mela Hesenî Dixwaze Bi Komployeke Din, Demografiya Bajarê Nexedê Biguhere



Di komployeke din ya ji bo guherîna demografiya bajarê Nexede û derdora wê de, demek dibe ku çend kesên Turk ku piraniya wan xelkê bajarê Heştrûd ya Tewrêzê ne, bi tehrîk û handana Mela Hesenî, pêşnimjê Urmiyê yê Şîiyan, li gundên ser bi bajarê Nexedê de mijûlê kirîna zevî û erdê Kurdan in û bo vê merema qirêj diraveke zaf terxan kirine û zevî û erdê Kurdan bi buhayeke giran ji xwediyên wan dikirin.

Hewce ye akinciyên bajarê Nexedê li hember vê komployê ku rewşê ji bo dubendî û aloziyê di navbera Kurd û Azeriyan xweş dike, hişyar û haydar bin. Em daxwazê ji Kurdên welatparêz yên herêmên bajarê Nexedê dikin ku bi nefirotina zevî û erdên xwe, vê pîlan û komployê pûç û vala bikin.

---

# Du Bûk Û Zavayek!!!



Zavayê 28 salî li herêma Fûmen a Bakûrê Îranê ji bo bicihanîna kevneşopa Pêxemberê Îslamê li rojekê de du keçên 24 û 27 salî ji xwe mare kirin.

Her çiqas ku axaftinên zaf li ser zava û her du bûkan de hene, lê li gor agehiyan zava pêwendî bi bûka 27 salî ve hebûye û kes jî pê nehesiya ye. Her di wê demê de malbata zava jî keçeke 24 salî ji kurê xwe re dibînin û li dijî bûka 27 salî derdikevin.

Di encama vê nerazîbûnê de keça 27 salî gefa xwekuştinê dike.

Piştre zava dikewe nava dudiliyê û nizane ku kîjan ji wan hilbijêre. Aqibet biryara xwe dide û ji wan re dibêje ku amade ye bi herduyan re bizewice. Her du keç jî yan li neçarî û yan jî... razî dibin bi zewaca bi wî re!!




# Keça Kurd, Benaz Mehmûd Çima Û Çawa Hate Kuştin?



Mezintirîn rojnameya Înglîzî nivîsand ku bav, ap û xizmên keçeke 19 salî di kuştina wê de sûçdar hatine dîtin.

Li gora daxuyaniyeke polîsên Înglîz, keça bi navê Benaz bû qurbana "parastina şerefê."

Rapor diyar dike ku Benaz hatiye xeniqandin, piştre laşê wê xistine çenteyekî kincan û ew di hewşa malê de veşartine.

Sedema kuştina vê keçê weke gelek cînayet û kuştinên din eşq û evînî bû ye… pêwendiyeke eşqê di navbera Benaz û xortekî Kurd ji rojhilatê Kurdistanê (Rehmet Silêmanî) çêbûye, lê malbata wê nerazî bû ye…

Berî ku were kuştin, Benazê 4 caran polîs agahdar kiribû ku malbata wê dixwaze wê bikuje.

Polîs bi ne parastina wê, bi tundî ji aliyê medyaya Înglîz ve hate rexnekirin, polîsan dikaribû wê biparêzin û rê li pêşiya vê cînayetê bigirin, lê wan texmîn nedikirin ku bavek rabe û ji ber evîniyê keça xwe bikuje.

Polîs piştî 3 mehan ji wendabûna wê, li laşê wê rast tê.

Erd bi qasî 6 metreyan hatibû kolandin û laşê wê têde hatibû veşartin.

Dema ku temenê Benazê 10 sal bûn, malbata wê ji Kurdistanê hatibû Brîtanya, ew di 17 saliyê de zewicandibûn, lê mêrê wê pir lêxistibû û ew berdabû.

**Çavkanî, Avestakurd**

# Masiyên Biçûk Mirov Ji Nesaxiyên Dil Diparêz İn



Li gorî çavkaniyan, lêkolînvanan daye zanîn ku masiyên hûr û biçûk ji hemû xwarineke pêtir mifah bo saxlemiya mirov hene çûnku baştirîn çavkaniya madeya "Omêga34"ê ye. Madeya han alîkariyê bi kêmbûna tûşbûn bi nesaxiyên dil dide.

Bi raya pisporan ew masiyên ku temendirêj in û li laşê xwe de mezin in, bi sedema dirêjbûna jiyê wan, rûnê zaf li laşê wan de kom dibe, lewre gellek baş e ku bi pijyayî bihên xwarinê û tûkilê wan jî bihê hilgirtin, bi taybetî bo wan kesên ku qelew in.